Nordkurdiska
Skola

Xwendegeh

Roja hilbijartinê ya li 17’yê îlonê, wê biryar li ser pêşeroja Swêdê bihêt dayin û ez û tu em bi xwe hildibijêrin. Em hemû xwedî berpirsiyarek in, graniya dengê me her yek e. Ma em ê xurtbûna civata xwe baştir yan xirabtir bikin bi vê kêmkirina kronekê ji her pênc kronên ji kîsê me yê beşdar ê bacê? Ma ew ê modêla swêdî bihêt pêşvexistin yan li cihê xwe hiştin?

Ji bo me Sosyaldemokratan ev pêdivî ye, ku tevayiya xwendekaran gerek bibin xwedî pileya zanebûnekê, daku li bazara xebatê û li civatê bikaribin debara xwe bikin. Zanebûn derfetê dide mirovî, da ku mirov li jiyanê pêşve here û bibe xwedî desthilat. Ji ber vê yekê ye, ku perwerde divêt çi car ji bo çend kesekê tenê ne be. Gava zanebûn bibe para her kesî, hingê zanebûn jî berfirehtir dibe. Perwerdeya bi kvalîteya bilind, ji bo ew Swêda me ya wekhev û bidad pêdivîyek e.

Tev xwendegeh divêt xwendegehên baş bin
Me na vê ku ji her 10 şagirdî yek ji xwendina seretayî (grundskola) herin lîseyê (gymnasieskola). Bi gelek mamosteyan, derfet ji tevayê xwendekaran re derdikeve, da ku xwendekar bikaribin xwe bigehînin amancên zanebûnan. Em ê xwe bidin ser karê li xwendegehan peydakirina gelek mamoste û pîsporan. Amanca peydakirina 15 000 mamoste û pîsporên din li dibistanan wê di nav sala 2006’î de pêk were.

Ew xwendegehên ku pêwîstî bi piştgiriya herî pir heye, wê piştgirî bigrin. Di nav van salên li pêşiya me, wê 225 milyon kron wê werin dayin ji bo dibistanên di nav dijwariyên herî dijwar de ne. Ev derfetên diravî her wisan ji bo bêhtirkirina pêşveçûna li ser pirsa xwendin- û zimanî, ji bo xwendekarên ji kok û binyad ji welatê din in. Ev bêhtirkirin wê hem ji bo zimanê swêdî û hem jî ji bo zimanê zikmakî be. Pêwendiya navbera malbat û dibistanê wê pêwendiya herî sereke be. Hingavê din a li pêş me ev e, ku em ji bo wan 100 xwendegehên, ku rastê dijwariyên herî pir hatine, derfet bidin wan da ku ji xwe re 1 000 pedagog bixin ser kar.

Pêşveçûna pedagokîkî û piralîbûn wê li temamê xwendegehan bihêt pêşdexistinê. Xwendegehên serbest, wê wek parçeyek xwendegehên şaredariyê (kommunal skola) kar bikin. Lê damezirandina dibistanên

serbest ên nuh, divê perwerde û xwendina zaruyên li xwendegehên şaredariyan ne be astek xirab.Gava ew ê destûr ji bo damezirandina xwendegehek serbest (fristående skola) were dayinê, ew ê pirsa lidervehiştinê bi taybetî were destnîşankirinê. Desthilatdariya şaredariyan ya li ser karê pêşvexistina xwendegehên serbest wê taybetî were zexmkirinê. Her kronek ji bacê ku wê li ser xwendegehê were razandinê, wê here perwerdeya xwendekaran. Ew xwendegehên,ku wek şîrketên bazirganiyê (aktiebolag) dihên bi rêvebirinê, heger qezenca wan dîsan vegere û bikeve kîsê dibistanê ji bo baştirkirina kar û barê wê, hingê ew ê piştgiriya aborî ya dewletî werbigirin.

Kes wê li paş ne hêt hiştinê
Çi keç û çi kur wê kes li paş ne hêt hiştinê li xwendegehê. Zaro her yek bi rengekê ne û cihê ne. Gelek şêweyê cihê yê hînkirinê li ber me hene, lê belê xwegihandina zanebûnê, mafê me her kesekî ye. Ji ber vê yekê pir grîng e, ku dêbav bibin xwedî agahiyên zelal, ku kar û bar li xwendegehan çawan bi rê ve dihere. Şopandina li ser pêşketina zanebûna xwendekaran wê bihêt zexmkirinê. Ji 1'ê Çileya Paşîn 2006'ê û vir ve, her xwendekarê li dibistanê, ji destpêka sala 1ê û pê de, xwedî mafê pîlana pêşketinê yê kesane (individuell utvecklingsplan) ye. Di vê plana kesane de, ku bi beşdariya xwendekar û dêbavan pêşkeve, wê pir zelal û aşkere be, ku çi tê xwastin ji bo xwendekar bikaribe xwe bigehîne amanca xwe ya zanebûniyê. Ev pîlana kesî ya pêşketinê, wê bi rêkûpêkî ji hêla xwendegehê ve were li bin çavdêriyê girtin.

Ji bo mamoste di serdemek pêşî de bizanibin ku xwendekarek pêwîstî bi piştgiriya zêde heye, Avahiya Sereke Ya Kar û Barê Perwerdeyî (Skolverket), nuha mijûl e, ku azmûnên dîagnostîkê (diagnostiska prov) ji bo xwandin û matematîkê amade bikin.

Lîseya Hevdem
Em Sosyaldemokrat me na vê ku ji 85% ê xortên 22-salî xwedî bi tenê xwandina lîseyê ya 3-salî ne. Ji ber vê yekê ye, ku em piştgirî didine wan xwendekarên lîseyê, ku xwedî dijwariyên herî pir in. Her wisan jî em hewla derfetên bêhtir didin, ku kvalîteya programa kesane (individuella program) ya lîseyê pêşvetir bibin. Tevayiya wan şagirdên, ku di bernameya kesane de ne, ew piştgiriya ku ji bo wan gerek e wê cîbicî bibe, da ku ew xwe bigehînin bernameya netewî (nationellt program). Her wisan em perwerdeya ji bo amadekariya pîşesaziyê (yrkesförberedande program) jî baştir dikin. Perwerdeyek nuh a lîseyê ji bo şagirdmendiyê (lärlingsutbildning) dest pêdike. Hevgirêdana di navbera mijarên bingehîn (kärnämnen) û mijarên pîşeyî (yrkesämnen) dihêt zexmkirinê. Insiyatîfên herêmî ji bo hevkariyê ya di navbera şaredarî û jiyana xebatkariyê dihêt ber bi pêşxistinê.

Alternativa vê
Li hevberî ramyariya xwendegehê ya Sosyaldemokratiyê, Moderat û ew hevbendiya baskê wan ê rastê (högeralliansen) dirawestin. Ew pêşniyar dikin ku azmûna gihaştîbûna ji bo xwendegehê

(skolmognadsprov) li dar bixin û wek notê qarneyê (betygsliknande omdömen) ji bo zarokê heftsalî bidin. Ma gelo ev rewa ye ku mirov wisan di temenê biçûk de mor li zarokan bixe, ku ew bi kêrî hînbûnê na yên? Li ew welatê Swêdê ku di bin destê hevbendiya baskê rastê de ye, ciyê temamê zarokan nîn e li dibistanan.

Hevbendiya rastê ya di bin dolîwgeriya Moderatan de, dixwazin bernameya kesane ya li xwandina lîseyê daxin û her wisan karguzeriyên li nik van şagirdên, ku li ser xwandina pîşesaziyê ne. Ev hevbendiya rastê dixwaze pêşerojê bi ramyariyek rastê bidin ber mirovî, da ku cudahiya di navbera xelkê bêhtir bibe, daxwaziya ji bo zanînê kêmtir bibe û hêza berberiyê ne mîne.

Li Swêdê wê her kes beşdar be. Ma tu kîjan Swêdê hildibijêrî?